Roder, A. (2020). Hêmayên homoseksuel û karakterên queer
di destana Memê Alanî da. *Folklor û Ziman,* 1(2), 61-88.
**Wergirtin/Received:** 2020-07-20
**Qebûlkirin/Accepted:** 2020-09-18
**ORCID:** 0000-0002-0790-7233

# HÊMAYÊN HOMOSEKSUEL Û KARAKTERÊN QUEER DI DESTANA MEMÊ ALANÎ DA

Aram Roder*

**Kurte**

Cureyên edebîyata gelêrî ku bi devkî di nav gel da belav bûne, di nav xwe da gelek caran nirxên civakî û çandî dihewînin û herweha çawanîya civakî jî nîşanî me didin. Li gorî konteksta civakî ya serdest ku tê da hatine afirandin û vegotin jî hêmayên nexwestî bi awayekî veşartî di nav wan da cih digirin ku yek ji wan jî homoseksuelî ye. Di hûnana destanan da fikrên hetero-patrîarkî ku bi rêya dîyalekt/dualîzmê îqtidara xwe li ser yên din, di bin sîwana nirxên çandî-civakî û dînî da dimeşîne, dihêne pîrozkirin û bi vî awayî hestên homoerotîk di bin nirxên çandê da didin veşartin. Ji ber vê yekê vegotin li gor îqtidar û hestên heteroseksuel teşe digire. Lê dîsa jî ev hestên homoerotîk bi rêya hin karakter û hin tevgeran dikare bihê dîtin. Di vê çarçoveyê da jî ev xebata berdest analîza destana Memê Alan li gor teorîya Queerê dide ber xwe. Memê Alan destaneka kurdî ye û di nav kurdan da jî gelekî berbelav û navdar e. Di vê xebatê da ev destan bi têgihên teorîya navborî wekî zayend, zayenda civakî, nasname, ziman, çand, mirin, arezû, hez û hes hatîye analîzkirin. Di nav vê destanê da hinek hêmayên veşartî yên homoseksuelî û karakterên queer dikarin bihên dîtin.

**Bêjeyên sereke:** Memê Alan, pirevînî, queer, zayend, zayenda civakî, ziman

* Lêkolerê serbixwe. Wan/Tirkîye. E-mail: aramroder@yahoo.com

## HOMOSEXUAL THEMES AND QUEER CHARACTERS IN THE MEMÊ ALAN EPIC

**Abstract**

Folk literature, which is spread orally among the people, often contains social and cultural values within itself and thus presents the social quality to us. According to the dominant social context, the unacceptable elements that are created and said are secretly included in these structures, one of which is homosexuality. In the fiction of epics, hetero-patriarchal thoughts are maintained by the pressure of religious and social-cultural values on others through dialectics, they are blessed and thus homoerotic feelings are hidden under the name of cultural values. Hence the story takes shape according to power and heterosexual feelings. However, these homoerotic feelings can still be learned through some character and behavior. In this context, this study we have tried to be analyzed according to the Memê Alan Epic queer theory. Memê Alan is an epic in Kurdish and has become widespread among Kurds as well. In this study, this epic was analyzed within the framework of these concepts such as gender, gender identity, language, culture, death, desire, love and pleasure. In this epic, some hidden homosexual symbols and queer characters are identified.

**Keywords:** Memê Alan, much love, Queer, sex, gender, language

## Destpêk

Edebîyata gelêrî bi giştî ji alîyê gelek teorîyan ve hatîye nirxandin. Lê di derbarê teorîya *Queerê* da xebateka bi vî rengî nehatîye kirin yan jî heta vê gavê ez negihîştim xebateka wisa. Ji berhemên wêjeyê bigire heta gelek qadên çandî-civakî polîtîkaya *hetero* serdest e. Pergala *hetero-patrîarkî* wekî di her qadî da di nav wêjeyê da jî pergala xwe li gor zayenda civakî ava kirîye. Heke ne wisa be? Bi vê yekê rê li ber teorîya Queerê jî vedibe û êdî li gor teorîya Queerê lêpirsîn ji înşaya hetero-patrîarkî ra dikare bihê kirin. Ji bo vê yekê hewce bi lêgerîna zayenda xwedîyê berhemê namîne. Teorîya Queerê li ser mafên *kêmaran* disekine û dibêje hemû nasname hatine avakirin (Butler, 2014a, r. 66-77). Ev kesên kêmar wekî jin, zarok, homoseksuel, çîn, nijad û heta jîyana heteroseksuel jî di nav xebatên zanistî da bûye mijara teorîya Queerê.

Mijara vê xebatê di destana Memê Alanî[1] da li gor teorîya Queerê nirxandina zayenda civakî ye. Di vê çarçoveyê da nasnameya zayendî ya ku di vegotinê da li ser *vulva[2]-penîs* hatîye avakirin jî dê bibe mijara lêpirsînê. Bandora çand, ziman û jîyana heteroseksuel xwe di destanê da bi çi awayî nîşan daye; ceribandinên cinsî û arezûyên homoseksuel di nav evîna heteroseksuel da çawa hatîye şêlûkirin û rûreşkirin hatîye analîzkirin. Gelo di mijareka heteroseksuel da karakter û têmayên homoseksuel dikarin bihên dîtin? Yan jî bi awayekî veşartî di destanê da cih digirin? Gelo pirevînî dualîzma heteroseksuel dikare serûbin bike? Gelo meylên cinsî tenê di heteroseksuelî da mane yan xwîneran/guhdaran ber bi hez, arezû û meylên cinsî yên guherbar ve dibin? Bi mirinê laş çawa dihê *queerkirin?*[3] Lewma di vê xebata berdest da jî armanc, di vê çarçoveyê da lêgerîna nîşaneyên queer di destana Memê Alanî da ye. Gelo ka zayenda civakî û laşî di vegotinê da li gor nirxên çandî çawa hatine derbirîn, yan jî çawa teşe girtine?

1 Ji bo berhema Memê Alan, ya ku em li ser analîz dikin ku berhevkarê destanê Roger Lescot e. Ev berhem bi nivîsa Roger Lescotî di gelek weşanxaneyan da hatîye çapkirin. Pirtûka Memê Alan bi pêşgotina Kendal Nezan, di sala 1999an da weşanxaneya Gallimard, bi navê Mamé Alan (Epopée kurde) derket. Ev berhem di weşanxaneyên Roşna, Orfeus, Çima û Avesta da hate çapkirin. Ev berhem dema hatîye nivîsîn, Roger Lescot ji gelek varyantan sûd wergirtîye. Berhema ji bo xebatê hate bikaranîn jî, di sala 2010ê da weşanxaneya Avesta bi zimanê kurdî, li ser navê Roger Lescot çap kirîye.

2 Têgiha vulva û penîs li gor Teorîya Queer zayendê dîyar nake. Lê herçiqas ev wesle ku zayendê dîyar nekin jî, ji bo ku mijar bihê famkirin em dê wekî telafûza patrîarkî van her du têgihan bi kar biînin.

3 Redkirina nirxên hetero-patrîarkî ne ji ber ku hetero-patrîarkî li gor zayenda laşî û civakî teşe girtîye û nirxên xwe bi kesan dane hînkirin.

Ji ber ku gelek varyantên vê vegotinê hene, me ya Roger Lescot (2010) li ber çavan girt. Ji ber ku lêkoler heta ji wî hatîye ji gelek dengbêjan li vê berhemê guhdarî kirîye û bêkêmasî gihandîye berdestê me (Lescot, hb, r. 8-9). Herweha ji alîyekî din ve dê lêpirsîn li ser performatîfa heteroseksuelî bihê kirin. Analîz dê di çarçoveya teorîya Queerê da bihê kirin. Xebat, bi vî awayî bêhtir giranîya xwe dide teorîyê û di çarçoveya teorîyê da jî li ser analîza metinê hûr dibe. Di xebatê da herweha dê ceribandinên cinsî yên homoseksuel wekî rapora Kinseyî û tesbîtên Sedgwickî, teoriyên Butlerî, analîzên Halberstamî û hin teorîsyenên din dê bihên destnîşankirin. Kinsey dibêje xwerû heteroseksîstbûn tune ye û li gor hin pîvanan sînorên meylên cinsî dîyar kirîye (Kıraç, 2013, r. 3-4). Afary û Anderson jî dibêjin ku hestên homoerotîk jin ji xwe ra dike pêlekan û li gor nirxên çandî mêrîtî dihê berzkirin ku hestên homoseksuel bihên kuştin (Afary&Anderson, 2011, r. 254). Herweha Butler jî dibêje ku zayenda laşî jî wekî zayenda civakî pergala patrîarkî ava kirîye (2014a, r. 168-190). Lewma xebat bi vî awayî xwendineka Queerê ye li ser nivîskar/dengbêj û tekst/destanê û hewildana tesbîtkirina bê gelo guherbarîyên arezû, hez û hestan di destanê da xwe nîşan didin yan na.



## 1. Teorîya Queerê

Teorîya Queerê li ser peyva *queer*ê bixwe hat avakirin ku di nav dualîzma heteroseksuel da, di nav dijberîya normalê da bûbû nasnameya kesên kêmar. Queer ne tenê di têgihê da asê ma, bi demê ra teorîya xwe jî ava kir. Têgiha *"queer"*ê di maneya *"ecêb, sosret, xwar, anormal, kerax, kesê rezîl"* da dihê bikaranîn (Yardımcı&Güçlü, 2013, r. 17). Vê têgihê bi demê ra, di nav xebatên akademîk, polîtîk, sîyasî û zanistî da jî cih girt. *"Micheal Warner, Judith Butler, David M. Halperin û Laurent Berlant wekî disîplîn ev teorî xistin nav xebatên disîplîner"* (Yardımcı&Güçlü, hb, r. 20-21). Fikirên Althusserî jî li ser vê teorîyê bandor kirîye. Di serdema postmodernîst da teorîya Queerê di *"nav psîkanalîza wekî Jacques Lacan, Luce Irigaray û Julia Kristeva da ji xetekî post-Lacanî"* teşe girtîye (Özküralpli, 2016, r. 221).

Ji bo vê teorîyê, Jackson û Scottê dibêjin ku *"ji bo zayendên mixalif yên di nav perspektîfên postmodern da, wekî teorîyekê derketîye"* (2012, r. 48). Ji bo teorîya Queerê teorîsyen dibêjên ku *"Foucaultyî wekî teorîk bandor li ser nîqaşên queerê kiribe jî di heman demê da ji binyatgerîya [déconstruction] Derridayî û ji psîkanalîza Lacanî sûd werdigire"* (Jackson&Scott, 2012, r. 49). Ramanên

teorîsyenên postmodern/binyatgerî rê li ber teorîya Queerê vekirin. Herweha ramanên femînîstan jî ku li ser zayenda civakî rû didin; wekî Wittig, Irigaray, Kristeva û Beauvoir di mijara zayenda civakî da rê li ber fikirên Butlerî vekirin. Butler jî di hin cihan da teorîyên femînîstan rexne dike û dibêje ne tenê zayenda civakî hemû nasname înşakirina çandê ye. Ozkuralpli ji Halperinî (2003, 340-341) radigihîne û dibêje, *"di Zanîngeha California da Theresade Lauretis bi sazkirina konferansê bi weşandina pirtûka Judith Butler ya bi navê Cinsiyet Belası (Gender Trouble) û pirtûka Eve K. Sedgwickî ya bi navê Epistemology of Closet Queer (Epîstemolojîya Dolabê) kete nav akademîyê"* (Özküralpli, hb, r. 219).

Teorîya Queerê pêşnîyaza bênasnamebûnê dike û dibêje pêwîst e hemû cureyên polîtîkayên nasnameyan (nijad, çîn, qewmî û zayendî bihên redkirin. Di nivîsa Erdem da dibêje ku *"hin zayendîyên heteroseksuel dibin queer, hin têkilîyên homoseksuel jî dûrî pênaseya queerê dikevin"* (2012, r. 46, 47). Di berdewamîya nivîsa xwe da Erdem dibêje: *"Têkilîyên heteroseksuelan yên derveyî yekjinî/yekmêrî, . . . hevşabûna di nav temenê ne nêzîkî hev, SM[4], fetîş û [MSM[5]] di nav heteroseksuelî da alîyê queerê ava dikin"* (hb, r. 47). Polîtîkaya *heteronormatîf*[6] xeynî ceribandinên cinsî yên heteroseksuel her têkilîyên cinsî wekî nexweş, şaş, guneh, rûreşî û jirêderketinê dibîne. Di hevşabûnê da vulva û penîsekî hewce dibîne; peyva *normatîf*[7] jî li ser nirx û ceribandinên vê jîyanê dihê avakirin. Anormatîf/nenormatîf jî ji bo ceribandinên cinsî yên ne heteroseksuel dihê manedarkirin. Çima heteroseksuelîyê wekî normatîf dibînin? Dibêjin qaşo têkilîyên cinsî, divê ji bo zarokanînê be. Palpişta wan jî nirxên çandî û dînî ne. Butler jî dibêje, *"Zayenda laşî û zayenda civakî her du jî li ser pratîkên cînsî hertim nakokîyên hest û berdewamîya hestan diafirînin"* (2008, r. 60).

4 SM wekî kurteya sadomazoşist hatîye dayîn.

5 Mêrên ku bi mêran ra têkilîyên cinsî dijîn lê ku derveyî civaka geyan disekinin ra dihê gotin.

6 Heteroseksueltî bi tenê normal û meylek cinsî dihê dîtin, nirxên civakî, pîvan û teşeyên jîyanê wekî her kes heteroseksuel e qebûl kirine. Mirov wekî jin û mêr hev dihê veqetandin; têkilîyên cinsî/zewac bi tenê zayendên li hember xwe dikare bihê kirin û hemû bawerî, norm, û ramanên îddîa dikin ku her zayend rolên wan yên taybet hene.

7 Normatîf, kesê ku li gor çanda civaka serdest bijî. Mirov li gor laş yan jin jî mêr dihê pênasekirin. Yanî mêr bi jinanra ji j3i bi mêranra bizewice. Tevgerên di nav van de nebe dibe anormatîf

Afary û Anderson di xebata xwe ya derbarê zayenda civakî û homoseksuelîya mêrî ya di nav civaka misilman û Behra Spî da dibêjin: *"Heredotî, Persîyan evaya [homoseksueltî] ji Yewnanan hîn bûne [îdîa dike û ji bo zewacê jî van gotinan bi par ve dike] îslam, wekî mûsevîyan heza cinsî erê dikin lê divê ev di zewacê da bihê tehmkirin"* (Afary&Anderson, hb, r. 253). Elçik di nivîsa xwe da li ser sekina pergala Osmanîyan disekine û dibêje: *"Di nav Osmanîyan da homoseksuelî ancax piştî Tanzîmatê (1839) wekî eyb hat dîtin"* (2016, r. 193). Loma, wekî ku ji vê mînaka Osmanîyan jî bihê xuyakirin civak li gor rewşa sîyasî û çandî ya demê polîtîkayên xwe jî diguherînin. Herweha Kiraç jî dibêje ku *"Piştî Ebasîyan kesê aktîf li gor kesê pasîf bêhtir di nav civakê da dihate qebûlkirin"* (2013, r. 5). Erdem jî dibêje ku *"tu pirsgirêka civakê bi homoseksuelên veşartî ra tune. . . . bi wan kesan ra ku zayendîya xwe eşkere dikin, çêdibe"* (hb, r. 47).

Lewma zayenda civakî jî li gor organên ku bi zayendê ve hatine hevmanekirin (vulva-penîs) rol li ser laşan bar kirine. Butler li ser zayendê di pirtûka xwe da dibêje: *"Heke dualîzma heteroseksuel tune bûya, wisa dihê dîtin ku li ser mijara [ku em behs dikin, îstiqrara pozîsyona zayendîkirinê, lêpirsîn dikaribû bihata kirin"* (2014b, r. 80). Butler van gotinan ji bo pozîsyona zayendê bi par ve dike û dibêje ku heke pozîsyona nêr û mê wekî dijber yan jî wekî hevtemamkirinê nehata dîtin, wê demê nêr û mê ji hev nedihat veqetandin (2014b, r. 80). Yanî li gor vê nêrînê ev tişt dikare bihê gotin ku bi rêya telafûzê ev pozîsyon hatîye dîyarkirin. Bi van polîtîkayan hem homoseksuelî hem jî zayendên din li ser avakirina bikerê disekinin. *Bikerbûn* ji xwe ra zayenda duyem diafirîne. Butler li ser ceribandineka Wittigê disekine û dibêje Wittigê gotîye *"ku pergala zayenda dumendî hilweşe qada çandeka ku gelek zayend tê da hene dê derkeve meydanê"* (2014a, r. 200). Eger em careka din berê xwe bidin pozîsyona zayendê; Butler di vê mijarê da li ser têgiha madeyê (dekonstruksîyona laşî) disekine û dibêje: *"Di vir da made, li ser cudahîyê hatîye zayendkirin, ji ber vê yekê xwe qadek bêbiryar, di forma xwe ya nêrtî da laşek ne laş, di forma mêtî da jî madeyek ne laş wekî têgihekê [xwe] bi cih dike [û] derdikeve pêşîya mirov"* (2014b, r. 78). Vê yekê jî bi penetrebûnê[8] ve girê dide. *"Dema ku laşekî mê dor bihata wê yan jî di şertekî din da [kesê li hemberî xwe] penetre bikira, wê demê mêtîya wê dê bimaya [?] û nêrîtîyê dikaribû nasnameya xwe ya ku li ser cudahîyê ava bûye biparasta [?], em ne*

8 Penetre peyveka Fransî ye û bi kurtî dikare bihê gotin ku tiştekî bikeve nav madeyê. Ya dikevê penetre dike û ya ku dixe xwe penetre dibe.

*bawer in"* (Butler, 2014b, r. 80). Butler bi vê yekê hem kesê penetre dike û hem jî kesê penetre dibe ku her du jî zayendekê dîyar nakin vedibêje. Di vir da Butler, li ser vê madeyê dibêje ku *"Ew, wekî mêyekê, hertim her tiştî dixe hindirê xwe, qet ji xwezayîya xwe dernakeve û qet tu caran . . . tiştên ku dikevine wê da şêweyên wan êwir nake"* (2014b, r. 78). Palpişta heteronormatîfê ne tenê bi penetrebûnê, bi lêkera *êwirbûnê (eilephen)* ve jî girê dide. Di vê êwirê da qedexe rû dide. Yanî *"tu caran ev mê di xwezayîya xwe da dernekeve, ji xwezayîya xwe neqete"* (Butler, 2014b, r. 79). Yanî bi vê yekê bi rêya zêdebûnê polîtîkayên heteronormatîf da Butler dibêje ku *"Tu car mêtî penetre nake"* (2014b, r. 79, 80).

Polîtîkayên heteronormatîf jî hêlîna xwe di nav çandan da dadiîne. Çanda patrîarkî[9] herçiqas bi gelemperî li ser têkilîyên heteroseksuel xwe ava bike jî nikare jîyana homoseksuelî veşêre. Wekî mînak Cyrus Shamisa (2002, r. 10) di berhema xwe ya bi navê *Shahidbazi dar Adabiyyat-i Farsi (Di Wêjeya Farizî da Homoseksuelî)* da di derbarê Rojhilata Navîn da dibêje ku *"Wêjeya Farisî di esasê xwe da wêjeyeka homoseksuelîyê ye"* (veg. Afary&Anderson, hb, r. 254). Ji bo vê yekê Afary û Anderson dibêjin ku *"Di nav erdnîgarîya Rojhilata Navîn da ev cure têkilî gelekî berbelav in. Gelek mêr li pey xortên ciwan diçûn"* (hb, r. 256-257). Ev jîyana homoseksuel xwe di berhemên kurdî da jî nîşan dide. Wekî di pirtûka Jan Dost ya bi navê *Mîrnameyê* da ev jîyana hûnayî dihê dîtin. Dibe ku di vir da kûştina Ehmedê Xanîyî bi laşek homoseksuel ve bihê girêdan (2012, r. 203-207) û armanc jî ev be ku laş wekî queer û talûke bihê nîşandan. Herweha Mela Mehmûdê Bayezîdî di pirtûka xwe ya bi navê *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* da dibêje ku *"Wekû dinê kaffêd (hemû) qebahetan di Ekradan da peyda dibitin. [Lê] Liwat e (kurbazî, lawhebînî), yanî eslen waqî' nabitin (naqewime)"* (Bayezîdî, 2012). Mela tenê qala kurbazîyê kirîye lê qet qala jinbazîyê nekirîye. Yanî di berhema Ehmedê Xanîyî da ku jinbazî dihê dîtin, mela qet agahî li ser jinbazîyê nedaye. [10] Heke ku xebateka Melayî li ser vê mijarê bi awayekî îstatîskî hebe jî lê min wek çavkanî bi dest nexist. Ji bo vê yekê ez îdîa dikim ku zanîneka Melayî li ser homoseksuelbûnê tune bû, li gor bîrûbawerîya serdemî tevgerîyaye û di destê Mela da tu îstatîstîk tune bûye ku ev jî berê me dide têgiha nasnameya zayendî.

9 Pergala pederşahî, di nav civakê da bi bikeyskirin û pratîkên çandî û desgehî ve ku pêpeskirina jinê [yên din] diîne nîşan dide. Dihê maneya desthilatdarîya mêrî (Berktay, 2016, r. 24).

10 Ji bo van agahîyan spasî ji bo Mamoste Zeynelabidin Demir

## 1. 1. Nasname

Nasname li gor polîtîkayên serdemî newekhevîyekê li ser laş, kom, çîn, civak û nijadan ava dike. Di paradîgmaya hetero-patrîarkî da nasname, bi rêya kromozom, hormon, malezarok û vulva-penîs û ceribandinên cinsî xwe dane qebûlkirin. Lê wekî ku Butler dibêje, ev ne mimkun e (2014a, r. 185-186). Li gor Butlerî hem zayenda laşî (sex) hem jî ya civakî (gender) bi sekineka sîyasî hatîye avakirin (2014a, r. 37). Nasnameya zayendên wekî transvestizm[11], transeksuel[12], travestî[13], transgender[14] û hunsa/interseks[15] wekî mînak em dikarin bidin.

Kiraç jî di xebata xwe ya doktorayê da li ser nasnameya zayendî disekine û dibêje ku *"Li gor paradîgmayên sirûştparêz, bîyolojîk û xweparêz nasnameya zayendê sabit e. . . . Li gor paradîgmayên hawirparêz û binyatgerên civakî (social constructionist) nasnameya zayendê girêdayî dem, mekan, şert û mercên civakî û dîrokî ye. Li gor vê paradîgmayê nasnameya zayendê guherbar e"* (2013, r. 43-44). Di heman xebatê da Kiraç li ser nasnameya homoseksuel jî dibêje ku *"homoseksuelî, têgiheka civakî ye ji bo ku homoseksuelan patolojîk bikin ji alîyê piranî (girseya mezin) ve hatîye hilberandin"* (hb, r. 44). Bêyî îradeya kesan, nasname li ser wan dihê barkirin û xwestek û hezên kesan xwe vedişêrin. Erdem ji bo veşartinê dibêje ku *"Pirsgirêka civakê bi wan kesan (homoseksuel) ra ku xwe vedişêrin, tune ye"* (2012, r. 47). Meylên zayendî ne girêdayî zayenda laşî ne ku ev jî berê me dide têgiha meylên zayendî.



## 1. 2. Meylên zayendî

Meylên zayendî li ser daxwaza arezûyan teşe digire. Di meylên cinsî da tercîh bêmane dimîne. Meylên cînsî di hest, hez û arezûyan da xwe veşartine. Têkilîya ensest jî jixwe ji wir dihê. Ev yek jî girêdayî psîkolojîya mirovan e û ji bo wê yekê Butler dibêje ku *"Di kêfdanê da . . . sirûştîya fantastîk ne di laşî da ye"* (2008, r. 140).

11 Cil û bergên zayenda li hemberê xwe xwe dikin û wekî zayenda li hember xwe tevger nîşan didin. Ewropayê ev têgih beranberê Crossdresser e (Kaos GL, 2013, r. 9).

12 Kesê ku zayenda xwe wekî zayendek li hember xwe nîşan dide. Hem ji bo jinê hem jî ji bo mêrî derbas dibe. Hîskirina zayenda hemberî xwe ye (Kaos GL, 2013, r. 9).

13 Kesê bêhtir bi şikil, cil û bergan û tevgerên xwe, xwe zayenda li hember xwe nîşan dide (Kaos GL, 2013, r. 9).

14 Jin û mêrên têkilbûna cerahî kirîye yan jî ev têkilbûna cerahî nekirîye ra dihê gotin (Kaos GL, 2013, r. 9).

15 Jin û mêrên ku bi wesleyên cinsî yên neasayî yan jî bi wesleyên wekî malezarok bûne ra dihê gotin (Kaos GL, 2013, r. 12).

Meylên zayendî di navbera mirovan da li gor hest, hez, arezû, erotîk ji nêzîkatîya têkilîyên zayendî ra dihê gotin. Wekî heteroseksuelbûn, homoseksuelbûn (gey/gay, lezbîyen) û bîseksuelbûnê xwe nîşan dide[16]. Kiraç, li ser lêkolînên Alfred Kinseyî û hevalên wî disekine û pîvanê heteroseksuelbûn û homoseksuelbûnê li gor hin gavan dîyar dike û dibêje ku mirov *"kêm zêde homoseksuel in û li xwerû heteroseksuelîyê jî mirov kêm rast dihê, heta ev jî wekî anomalî [ne normal] dikare bihê wesfandin"* (2013, r. 3). Erdem jî jîyana heteroseksuel bi *hîzagirtinê* ve pênase dike û dibêje: *"Hîza digire, li gor ya pêşîya xwe şûna xwe çêdike, li şuna xwe naleqe, livan nade xwe, di cihekî teng û tul da asê dimîne"* (2012, r. 47).

Meylên zayendî li gor şert û mercên civakî dikarin bihên nîşandan yan jî dikarin bihên fetisandin. Li gor Foucaultyî, kesek ji bo kesekî xwedî hez û arezûyan be, ji bo vê rewşê li hemberê vî kesî/vê kesê yan jinek yan jî mêrek mecbûr nabîne û mînakên têkilîyên cinsî yên di nav Yewnana kevnar da dihat dîtin, dide (2017, r. 249). Bi vê yekê wekî Foucault dibêje jîyana homoseksuel *"heke em xweşbîn bin, pratîkên bi vî rengî, ji exleqê hevpar ya ji bo her kesî ne cudatir e"* (hb, r. 253). Herweha Butler homoseksuelîyê bi zewaca egzogamî ve jî girê dide. Butler di xebateka xwe da li ser xebatên Lévi-Strauss disekine û dibêje ku *"Bi rêya dan û stendina jinê ya di nav rîtuela egzogamî da mêr bi hev ve dihên girêdan"* (2014a, r. 96-102) û ev girêdan jî hestên homocivakî ku Irigarayê bi peyva homoseksuel bi nav kirîye, bi xwe ra diîne. Her çi be jî bi rêya zewacê laş li gor polîtîkayên heteroseksuel dihê terbîyekirin. Wekî *"li Afrîkayê û li Rojhilata Navîn, jîyana pirmêrtîyê heye"* (Schroedter&Vetter, 2014, r. 35).

Foucault ji bo zewaca di nav Yewnana kevnar da dibêje ku *"Mîrata xwe . . . ji bo bigihîne nijada xwe"* ev rîtuel ava bûne (2017, r. 355). Malbat di kîjan cureyê da ava bibe jî polîtîk e. Ev yek di xwe da hestên queer jî dihewîne. Ji ber ku Rubin dibêje ku *"[zewaca] heteroseksuel ji bo danûstendinê divê nebe"* (2014, r. 31). Yanî ji bo zarokanînê di navbera jin û mêrek da be. Butler jî li ser xaleka

16 Heteroseksuel: Jin yan jî mêrên wekî di warê hest, cinsî û erotîk da di têkilîyên zayendî da nêzîkatî nîşan bide. Mecbûrî di nav civakê da çêbûye.
Homoseksuel: Jin yan mêrên di warê hest, erotîk û cinsî da meylên cinsî bi hevcinsa xwe ra nîşan didin ra dihê gotin.
Lezbîyen: Jinên ku dilên xwe dibijînin jinan ra dihê gotin. Di warê hest, cinsî û erotîk de.
Gey [Gay]: Mêrên ku dilê xwe dibijînin mêran ra dihê gotin. Di warê hest, cinsî û erotîk de.
Bîseksuel: Jin yan jî mêrî hem ji zayenda xwe ra hem jî zayenda din ra di warê hest, cinsî û erotîk da meyl nîşan didin ra dihê gotin (Kaos GL, 2007, r. 5, 6).

din disekine û ev yek jî bi analîzên Eve Sedgwickî ve girê dide û bi teswîrkirina Lévi-Straussî diîne ziman û dibêje ku *"Di helbestan da hestên ji bo jina ku bi devê mêran dihê gotin, berevajîkirina arezûyên mêran yên homocivakî ne"* (2014a, r. 99). Di bin mehrema civakê da arezû dihên veşartin lê wekî ku Sedgwickî gotîye *"mêrbûn ji arezûyên wan wêdetir e"*[17]. Yanî bi sekina hişk/maskulen ev arezû hatine veşartin. Meylên zayendî di tevger û ceribandinên cinsî da ku ne girêdayî vulva-penîsî ne, xwe nîşan didin.

**1. 3. Zayendî**

Jackson û Scott dibêjin ku zayendî *"hemû arezûyên erotîk û hemû pratîk û nasnameyan dixe nav xwe. [Heke em] ji bo îsbatkirin û meşrûkirina şêweyê jîyana cinsî ya curbicur, tenê em guh bidin cinsîyên [serdestan], dê me di mijara nasname û pratîkê da asteng bike"* (2012, r. 17, 18). Li gor desthilatdarîya civakî ev rewş hatîye sîstematîzekirin. Ji ber ku *"têgiha zayendîtî, . . . di guherbarîyê da dê berdewam bike. Çinku, tiştên ku wekî erotîk ji ber vê zayendîyê jî dihê dîtin, teqez ne sabît e"* (Jackson&Scott, hb, r. 17).



Di têkilîya zayendîyê da Butler vê têkilîyê bi erojenîya laşî ve girê dide; li ser perçekirina laş û erojenîya parçeyan xwe dibîne. Ji bo vê yekê Butler dibêje ku *"Vulva, penîs, memik û yên din wekî wesleyên cinsî ku dihê binavkirin, hem laşê erojen bi van wesleyan dihê sînorkirin hem jî laş ji hev dihên veqetandin"* (2014a, r. 195). Ev hemû di nav polîtîkaya ziman da manedar dibe ku ev jî me ber bi têgiha zimanî ve dibe.

**1. 4. Ziman**

Li gor manedayînê hin tevger û sembol dîyar dibin. Bi vî awayî telafûza hest, arezû û xwestekan bi rêya zimanî xwe nîşan dide û di nav hûnana zimanî da mane bi darê zorê xwe dide qebûlkirin (Butler, 2014a, r. 78-80). Erşen di nivîsa xwe da gotina Yamanerê (2005, r. 10) bi par ve dike û dibêje ku *"Hemû pergalên raman û zimanî ji fallusê, yanî ji pergalek nêrzayî derketine"* (2018, r. 3). Manedayîn bi sekineka polîtîk çêbûye û girêdayî vê yekê, jibîrkirin jî di nav dîsîplîna heteronormatîf da pêk hatîye. Ev teşegirtin ku bihê jibîrkirin wê demê dîsîplîna jîyana heteronormatîf dê bêmane bimîne. Halberstam di vir da li

17 Ev agahî ji vê malperê hatîye wergirtin. bnr. http://www.gokcenezber.com/2015/10/gizli-arzular-oldurur/ gökçen ezber prf. 7.

ser hefizeyê disekine û dibêje ku *“hefize bixwe jî mekanîzmaya dîsîplînekê ye. [di vir da Halberstam li ser fikirên Foucaultyî disekine] Foucault ji vê yekê ra ‘rîtuela îqtidarê’ dibêje”* (2013, r. 28). Dema ku ji nav vê dîsiplînê derkevî, wekî Halberstamî dibêje ku tu dê rêya xwe winda bikî (hb, r. 29). Ev windakirin jî rêya queerê ye. Butler gumana Wittigê bi par ve dike, dibêje ku li gor Wittigê jin, lezbîyen, homoseksuelên mêr nikarin di nav pergala zimanî ya heteroseksuel ya mecbûrî da wekî bikeran xwe bi cih bikin. Li gor Kristevayê ziman ku bi laşî ve dihê girêdan wê demê xebatek naçe serî. Kristeva vê ramana xwe li ser xebata Lacanî ava dike. Butler jî vê fikira Lacanî bi par ve dike û dibêje ku *“Zagonên patrîarkî, bi temamî hêmakirina zimanî, yanî tiştê ku bi têgiha hêmayî dihê famkirin vesaz dike”* (2014a, r. 151). Ev hêma di nav polîtîkayên mêrên nêrzayî, ya rast di nav polîtîkayên mêrên heteroseksuel da bi rêya zimanî xwe dibîne. Bi rêya hêmayan *“dê ji bo kur dihê qedexekirin. . . . tabûya ensest ‘li ser navê bavî’ ew qanûn e ku dikeve merîyetê”* (Butler, 2014a, r. 81).

**1. 5. Rexneya Queerê**

Rexneya Queerê li dijî normalbûnê ye ku çanda heteroseksuel bêpirsgirêk dihê dîtin, bi awayekî vepirsî meseleya çanda heteroseksuel derdixe holê. Armanc serûbinkirina pergala heteronormatîf e. Dîsiplîna bêdîsîplînkirin yanî ji guherbarîya hest, hez, arezûyan bigire û di nav çandan da rîtuelên li gor nirxên çandî ku naheje, ji bo ku bileqîne tev digere. Li ser performatîfîya bêîrade teşe dide rexneya xwe.

Bi Serhildana Stonewall (1969) nivîsên wêjeyî, yên ku eşkere li ser komên kêmar disekinin, xwe nîşan dan. Berîya Stonewall, Oscar Wildeyî homoseksuelî xiste nav pelên dîroka wêjeyê. Paşê jî Woolf û Forster ev yek dan destpêkirin. Lê ne ku hestên homoseksuelî bi wan dest pê dike. Jixwe di gelek berheman da hestên homoerotîk wekî motîf xwe nîşan dane. Tenê ev hest, arezû û hez nehatine binavkirin. Jagose dibêje li gor Foucaultyî nasnameya homoseksuel bi serdema modern (1870) ve girêdayî ye (2017, r. 20-21). Jagose li ser fikirên John D’ Emilioyî disekine û dibêje ku di dawîya sedsala 19an da homoseksuel bi çanda kapîtalîzmê ra hatîye (2017, r. 23). Stevens jî dibêje ku *“wêjeya girêdayî homoseksueltîyê ne ku bi destê nivîskarên xwe wekî gey didin naskirin derketîye”* (2011, r. 8). Sedgwick di pirtûka xwe da dibêje ku *“aktîvîteya genital yekî ji yên din vediqetîne”* (1990, r. 8). Bi vê yekê li gor nav şeqan, li ser kes/koman neheqîyek

xwe nîşan dide. Di vir da *dolab*, wekî ku Winning dibêje, *"nasnameyên cinsî yên jîyana homoseksuel ku nikarin xwe eşkere bikin; wekî mekana veşartî dikare bihê pênasekirin"* (2011, r. 70-89). Nivîskar/helbestvan/dengbêj û hestên mirovan hertim ji bo xwe qadeka mehrem ava kiribûn û li gor vê hest û arezûyên xwe bi rêya her cure hunerê, wekî bi gotina Wildeyî *evîna ku navê xwe nabêje*, xwe nîşan dan û *"di hilbijartina zayenda objeyê da, di serê vê sedsalê da [20an] derketîye û wisa maye"* (Sedgwick, 1990, r. 8).

Li gor Jagoseyê teorîya Queerê di nav teorîya *postbinyatgerî* da dikare bihê bicihkirin (2017, r. 12). Ji bo postbinyatgerî Moran li ser fikirên Derrida disekine û qala *"logocentrisme" (cîderka gotinê)*, *"phonocentrisme" (cîderka dengî)* û *"différence"*ê[18] dike; berîya hêmakirinê, hêma wekî têgih û obje bûye. Tenê yek maneya tekstê tune ye. Hin gotin veşartî dihên gotin (Moran, 2013, r. 185-202). Li gor teorîya *xwerûtî/essentialism "arezûyên homoseksuel ji ber zordestîya çanda hetero ewqas veşartî ye ne mimkun e ku di çarçoveya akademîk da were îsbatkirin"* (Stevens, 2011, r. 9). Essentialism meylên cinsî bi çandê ve gire nade û tiştek hundirî û objektif dibîne (Jagose, hb, r. 18). Rexneya *binyatgerî* jî li ser zimannasîyê disekine û dibêje bi rêya ziman her tişt ji hev dihê veqetandin. Bi rêya ziman têgih maneyan werdigirin. Binyatgerî/konstruktîvîst dibêjin heke li ser maneya homoseksuelyê ferasetek çandî hebe; wê demê ku qala nasnameyên homoseksuel bihê kirin manedar dibe (Stevens, hb, r. 9). Xwestekên di binhişî da jî wekî ku *psîkanalîst* dibêjin bi rêya *ji devê xwe pekandinê* yan jî bi rêya *bibîrxistina azad* da xwe nîşan dide.



Di destana Memê Alanî da qaşo jîyana hetero-patrîarkî bê pirsgirêk e û evîn di nav serdestîya heteroseksîst da ye hatîye dayîn lê hêmayên homoseksuel çawa hatîye veşartin û fetisandin dê bihê analîzkirin. Dema ku ji nav vê dîsiplînê (heteroseksuel) derkevî, wekî Halberstam dibêje ku tu dê rêya xwe winda bikî ku ev rê jî queer e (2013, r. 29). Normalîteya hetero-patrîarkî serûbinkirin derfetek queer dê bi xwe ra bîne. Çi di warê zayendî û meylên cinsî da çi jî di warê çîna civakî û çandî da ku ev jî bi agahîyên derbarê teorîya Queerê da hate dayîn dikare bihê girêdan.

18 Derrida peyva différer ku dihê du maneyan (cudabûn û gîrokirin) di têgiha différence da peyda kirîye. Yanî li gor xwe peyvek afirandîye.

## 2. Analîza Destana Memê Alanî

Memê Alan yek vegotineka gelêrî ya kurdî ye ku di nav kurdan da gelekî berbelav e, gelek varyantên wê hene û herweha gelek xebat jî li ser hatine kirin. Wek mînak Evdirehîm Rehmî Hekarî di sala 1918-1919an di kovara Jînê da, Memê Alanî nivîsîye. Berhem bi şanokî hatîye nivîsîn. Di sala 2007an da weşana Weşanxaneya Lîsê ev pirtûka Hekarîyî bi zimanê kurdî çap kirîye. Kesên wekî A. Socin (1890), Oscar Mann (1906-1909), Hugo Makas (1926), Albert von Le Coq (1930), Roger Lescot (1942) û hin kesên din li ser vê destanê xebitîne û weşandine. Albert von Le Coq, di sala 1903an guhertoyek di *Kurdische Texte*ê da Memê Alan diweşîne (Tek, 2015, r. 14). Di pirtûka Zargotina Kurda I'ê da, Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl li ser destana Memê Alan xebitîne. Li ser sê guhertoyan sekinîne û vê xebata xwe di navbera salên 1954-1975an kirine. Ev xebat bi navê Memê û Zînê û Mem û Zîn kirine. Di pirtûka Folklora Kurmanca da jî, Hecîyê Cindî û Emînê Evdal li ser destana Memê Alanî xebitîne. Ji alîyê din ve ji bo gelek xebatan jî bûye çavkanî ku ya herî navdar Mesnevîya Ehmedê Xanîyî ya bi navê *Mem û Zîn*ê ye. Piranî bi rêya dengbêjan di nav gel da belav bûye.



Dengbêjî hunera gotinê ye. Hestên mirovan bi rêya gotinê dertîne. Dengbêj peywira dîroknasekî hildigire ser xwe (Aça û yd, 2016, r. 160-162). Traverso dibêje ku *"dîrok ji hefizeyê derdikeve, paşê jî mesafeyê dixe navbera xwe li gel rabirdûyê, . . . ji wê xelas dibe"* (2009, r. 9). Dengbêj peywira dîroknasekî hildigire û carinan bûyerên dîrokî carinan jî çîrok, hîkayetên gelêrî û destanan bi hunera xwe ya vegotinê bi guhdaran ra bi par ve dike. Gelek caran jî li gor xwestek û daxwazên cimaetê û guhdaran van gotinên xwe dihûne. Heke li gor binyatgerî û postbinyatgerî bihê analîzkirin; dibe ku hestên binhişî jî ku xwe di van vegotinan da vedişêre derkeve holê. Lewma xwîner/guhdar dikare vê dîsiplînê xera bike.

Karakterekî homoseksuel çima veşartî dihê dayîn, yan jî çima ev kes di nivîsê da be jî nayê dîtin? Her çibe jî di çîrok û destanan da kevneşopîyên gelan hene. Wê demê di van çîrok û destanan da ku li ser matrîsa heteroseksuel hatîye avakirin, têmayên homocivakî dê li gor kîjan pîvanî bihên dîtin? Yan jî wekî nêrînên Sedgwickî nîşaneyên homocivakî dikare bihên dîtin? Butler ji bo vê yekê dibêje ku jin dibe amûrek danûstendinê û eleqeyeka mezin ji jinê ra dihê nîşandan, ev homocivakî di bin qedexeya norman da dihê veşartin (2014a, r. 99, 237). Problem ev e ku bi sînorkirina zayendê û bi wesleyên bîyolojîk mirov çawa

dikare karakterekî ji nav pîvanên normatîf da derxe û analîz bike? Sedgwick ji bo vê yekê dibêje ku di helbestên romantîk da eleqeya bi jinê ra dihê nîşandan, ew arezûya ku di navbera mêran da nayê qebûlkirin (Butler, 2014a, r. 99). Ji ber vê yekê Butler vê rewşê bi *“différence”*a Lévi-Strauss ve girê dide û dibêje ku bi rêya danûstendina jinê yanî zewaca egzogamî ji bo arezûyên mêran gavek dihê avêtin (2014a, r. 99). Ji bo ku lêpirsîn ji dualîzma heteroseksuel bihê kirin, gere karekterên di destanê da li gor zayenda civakî û laşî bihên tesbîtkirin.

**2. 1. Karakterên hetero-patrîarkî**

Di destanê da hejmara mêran li gor ya jinan pir zêde ye. Memê Alan, Hesen, Çeko, Qeretacîn, Beko, Mîr Ezîn, Elî, Emer, Elmaz û hwd. Karakterên jin Zîna Zêdan, Sitî, Zîna keça Bekoyî, Rihan, Qîza Qureyşî dikarin bihên nîşandan. Xeynî Zîna Zêdan, Sitî û Zîna keça Bekoyî tu karîgerîya jinên din nayê dîtin. Ev karakterên jin li gor pergala patrîarkî wekî baş û xerab hatine dabeşkirin.

Li gor Kovelî *“hez ev tişt e ku ji nîşaneya arezûyê pêk dihê”* (1994, r. 163). Wê demê penîs dikare li ser zarkeçîyê yan jî li ser zarokên kurîn[19] îqtidara xwe bixemilîne. Di destanê da ev hez li ser laşê Zînê dihê nîşandan û dihê erotîzekirin. *“Eniya gewr e/ bisk û qeter berdane ser guliyane/ser textê piştê û qolincane”* (Lescot, 2010, r. 34). Li gorî Moranî *“hinek xwestekên mirovan, îd/binehişîyên wan hene lê belê ji ber ku di nav civakê da dijîn li gor nirxên civakê tevdigerin û van xwestekên xwe têr nakin, berevajî van xwestekên xwe ditepisînin, vedişêrin”* (2013, r. 151). Di destanê da li gor jîyana heteroseksuel teşe dane arezûyan û Zîn xwe di oda Mem da dibîne. Mirov dikare bibêje ku di destanê da bêhtir hestên hetero derdikevin pêş. Lê mirov dikare gelek tişt û kesan hez bike; dikare bihê gotin ku Zîn jî wekî objeyeka hezkirinê dihê xuyakirin. Lê obje di hezkirinê da bêmane dimînin (Schroedter&Vetter, hb, r. 20-21). Ji ber ku heteroseksuelî di nav nav desgeha malbatê da bi vulva-penîs manedar dibe. Heteroseksuelî bi rêya zewacê di nav desgeha malbatê da normalîze dibe.

Herweha dema em li ser destanê hûr dibin, dihê dîtin ku Elî Beg zewicîye yan jî nezewicîye eşkere nîne. Ev yek ji bo her dû birayên wî jî bi heman rengî ye. Li Cizîrê jî malbat, bi Hesen û Sitîyê dane avakirin. Xeynî van malbatan tu malbat

19 Di çanda Yewnana Kevnar da wekî paidika û di kevneşopîyên Rojhilata Navîn da wekî di dewleta Afganistan da ku zarokên kurîn di heta temenekî da ji bo arezûyên mêran di rola bacca bazi/baçabaze da di şûna alavên cinsî da cih digirin.

nayên dîtin. Mirov tunebûna malbatê bi queerbûnê ve dikare girê bide. Herçiqas qala mala Mîr Celal, Mîr Zengîn û Mîr Tacînî bihê kirin jî lê tu behsa jîyaneka heteroseksuel ji bo wan nayê kirin. Tu dibêjî qey ew kes hatine xesandin. Heke jinên wan hebe jî ne eşkere ye. Hem bajarê Mixribê hem jî bajarê Cizîrê dikare bihê gotin ku bi tunebûna malbatan, rewşeka queerî di van bajaran da xwe nîşan dide.

**2. 2. Karakterên Queer**

Memê Alan, Çeko, Hesen, Qeretacîn, şênîyên bajarî û hemû kes di rewşa queerî da ne. Ji bo vê yekê Jagose giringîyê dide ramanê Sedgwickî (1993b, r. 13) û dibêje ku *"pir zêde şehweta homoseksuelî ku hest pê naynin yan jî şehweta homoseksuelî hest pê dînin lê mirovên xwe wekî bi nasnameya gey û lezbîyen nîşan nadin lê sekineka queer nîşan didin hene"* (2017, r. 126). Halperin (1995, r. 62) dibêje queer dê û bavên ku zarokên wan çênabin jî yan jî yên zarokên wan hene jî dihewîne (Jagose, hb, r. 119-150). Ji ber vê yekê ku karakterên queer wekî tenê bi meylên homoseksuel nîşan dayîn, çiqas qels dimîne nîşan dide. Heke ku wisa be gelek karakter queer in. Beko ecêb/xerab nîşandayîn (şeytan) wekî queer dikare bihê dîtin.



Peyva homoseksuel li gor Jagoseyê di sala 1869an ji alîyê Karoly Maria Benkert ve hatîye afirandin (2017, r. 93). Yanî cara yekem di nav çandekê da qala hestekî derveyî jîyana heteroseksuel dihê kirin. Yanî hebûna hestên cinsî bi binavkirinê dest pê nake. Herçiqas li ser dîroka destanê, di gelek çavkanîyan da hin agahî bihên dayîn jî lê li ser dîroka destanê agahîyeka zelal di destê me da tune ye; wê demê di destanê da lêgerîn û lêkolîna karakterên homoseksuelîyê dibe ku bêmane bihêle; ji ber ku jîyaneka homoseksuel jixwe di nav çandê da tiştek asayî bûye lê bi demê ra ev jîyan wekî sosret hatîye dîtin yan jî binavkirin. Jagose li ser teza Althusserî disekine ku nasname bi rêya îdeolojîya serwer çêbûye û ev nasname li ser kesan mecbûr kirine (2017, r. 100). Ev gotinên Jagoseyê jî me ber bi vê fikirê ve dibe ku yan berîya tomarkirina destanê yan jî di dema tomarkirinê da ev karakter di nav nasnameyekê da bi zorê hatibin bicihkirin.

**2. 3. Qaşo-heteroseksuel**

Hesen, Çeko û Qeretacîn ji bo arezûyên xwe yên binhişî yan jî veşartî, dikarin dest ji Zînê/Sitî berdin. Di van rêzan da *"dilketîya wî Sitîya jina min be . . . îro bi şûn da, ji min ra wekî xwîşkan e", "Eger hati be ji bo Zînê . . . xwestika min bû û*

*ji niha bi şûn da, xweyînga min ji dê û bavane"* (Lescot, 2010, r. 83, 84) dihê dîtin ku hesûdîyê ji Mem nakin. Wê demê hestê hesûdî dihên windakirin. Yanî hesûdî ku dijberî pirevînîyê ye (Schroedter&Vetter, hb, r. 40-42) û li gor Schroedterî û Vetterê ev rewş dikare di nav şabûna pirevînî da bihê nirxandin (hb, r. 43). Em nikarin bibêjin ku Hesen, Çeko û Qeretacîn li gor edetê kurdan tevgerîyane û li ser soza xwe sekinîne, ku me li jor çend riste ji destanê daye, paşê ji bo evîna Zînê û Memî dengê xwe nakin. Heke ku ev edet be di nav kurdan ku li ser soza xwe disekinin; lê ez negihiştim edetek bi vê rengî û min di nav perên dîrokê da nedît ku kurd jinên xwe bidin yekî xerîb (Mem). Hesen, Çeko û Qeretacîn bi van sekinên xwe desgeha malbatê pûç derdixin; malbatê tune dikin û rengeka queer derdixin holê. Ji bo desgeha malbatê ji holê bihê rakirin her lehengek çi ji destê wî/wê dihê pêk diîne.

Yanî edetên herêmî û çandî nikarin maneya heteronormatîf biguherînin. Çeko ji bo Memî, dest ji Zînê berdide. Ji vê mirov dikare vê tiştê derxe ku arezûyên homoerotîk xwe nîşan didin. Ji bo vê yekê Butler xwe dispêre Sedgwick û dibêje ku *"jin tenê amûreka dan û stendinê ne. Yanî jin arezûya homocivakîya mêran e"* (2014a, r. 99). Lê normalîteya heteroseksuel yanî bedewbûna hetero di tevger û ceribandinên cinsî da li gor performansa vulva-penîsî manedar dibe.



**2. 3. 1. Bedewbûn**

Bedewbûn hem di warê laşî da, hem jî di warê matrîsa heteroseksuel û polîtîkaya parîarkî da xwe nîşan dide. Laş ji bo jinê û ji bo mêrî ne di heman maneyê da ye. Laşê jinê li gor laşê mêrî hatîye erotîzekirin. Elçik dibêje ku *"ji bo jinan bedew ji bo mêran xurt/zexim xuyabûn şertek ji bo civakîbûnê ye"* (2016, r. 188). *"Ev manedayîn, li gor encama prosedura xwe laşî hildiberîne"* (Butler, 2014 b, r. 47). Bi vê rêyê, matrîsa heteroseksuel dihê avakirin (Lescot, 2010, r. 34). Wekî Berktay gotîye *"Laş alava çandê ye"* (2016, r. 130).

Şerqî yan jî bedewbûna şerqî çi ye? *"Çi ye, gelemperî Rojava diçe Rojhilatê"* (Said, 2016, r. 83). Yanî Rojhilat dihê egzotîzekirin. Mem li bajarê Mixribê (R*ojava*[20]) dihê Cizîrê. Metafora rojhilat di laşê Zînê da dihê egzotîzekirin.

20 Ev têgih herçiqas ji bo nijada Ewropayê bihê bikaranîn jî lê di maneya vê têgihê da ji dêvla di xwe da dihewîne heyranbûyîna nijadê jî heye. Yanî wê nijadê (ereb) bilind û pîroz dibîne. Nijada xwe jî li gor wê wekî 'yên din' dibîne.

Mem jî temsîla *fallus*[21] e. Lescot ji folklornas O. Mannî radigihîne û dibêje ku Mem ereb e (Lescot, hb, r. 11). Ev rewş jî heyranîya nijadî bi xwe ra diîne. Hemû gelê Cizîrê ji bo fallusa Memî wekî obje dihên manedarkirin ku me li jor jî hin risteyên ji destanê dan, her kes hazir e ku jinên xwe bidin Memî.

Beko li hember têkilîya cinsî ya heteroseksuel, li dijî qanûnên çandî û civakî ye. Ev sekina Bekoyî binhişîya civakê nîşan dide. Civak/dengbêj jîyana homoseksuel, bi metafora şeytanî ve girê dide û xwe ji queerbûnê xelas dike. Beko bi têgiha *şeytanî* dihê queerkirin. Herçiqas di binehişî da mirov *"nikare tu agahîyê hîn bibe"* (Jung, 2012, r. 71) jî lê ji bo bedewbûna cinsî dengbêj bi sekina Bekoyî temsîla xwestekên cinsî yên binehişî di bedewbûna homoseksuel da dide nîşandan. Ji van tevgeran mirov dikare vê yekê derxe ku arezûyên civakê herçiqas di Zîna Zêdan da form girtibin jî lê bi rêya queerê (Beko) ev arezû xwe di binehişî da dide der. Di pergala patrîarkî da bedewbûn, hevgirîya laşî ye. Yanî bedewbûn têkilîya biker û objeyê ye. Bedewbûna heteroseksuel di destanê da bi mirinê ve dihê astengkirin. Şehweta cinsî ya queerî, mirinê bi xwe ra diîne. Lê *êsîrîya* Memî -vê hêsîrîyê ji bo gihîştina arezûya homoseksuel bi kar diînim ne ku ya girtîgehê- wekî Halberstam dibêje ku hin rexnegir hêsîrîyê wekî merhaleyên zaroktî û xamatîyê dikarin şîrove bikin (2013, r. 48); li gorî van fikiran bi xwendinek queerî, derfetek ji bo arezûyên guherbar ji bo Mem çêdibe. Ma Beko heta ku Mem neavêta girtîgehê nikaribû jehr bidaya Memî? Dibe ku dengbêj di vir da, lêpirsînek ji bo jîyana heteroseksuel kiribe. Bi vê lêpirsînê jîyanek utopîk anîbe ber çavê guhdaran.



Halberstam li ser çanda *sati*[22] ya hindîyan disekine; li ser gotara Spivakê ya bi navê *Madun dikare bipeyive?* da qala sedsala 19an, jinên piştî mirina hevserên xwe ku xwe dikujin dike (Halberstam, 2013, r. 175). Eger em di vê çarçoveya nirxandinên Halberstamî da li sekina Zînê binêrin, em dikarin bibêjin ku Zîn bi awayekî pasîf mirin red kirîye û di queerbûnê da maye (hb, r. 176 -177). Bi mirina Zînê, Zîn nayê pîrozkirin, Mem dihê pîrozkirin (lê ev mirin ku di nav bawerîya reenkarnasyonê da nebe). Ev rih digihîje tînê yanî digihîje Xwedayî. Lê dijî vê dikare bihê gotin ku mirin bi xwe ra paqijîyê diîne. Ev paqijî yanî ji laşî xelasbûn,

21 Ev têgih dê di sernivîsa '*2.3.2. Fallus*ê da dê berfirehtir bihê analîzkirin. Lacan ev têgih ji bo têgiha *îqtidarê* bi kar anîye. Îqtidarê jî ji bo xwedîtîya her tiştî (mal û milk, zar û zêç û hwd.) bi kar diîne.)

22 Di nav hindûyan da dema mêrê jinekê bimire, ji xwesteka mirina jinan ra dihê gotin.

bi xwendineka queer, laş guhertine. Yanî ji bo xwestekên cinsî yên guherbar Mem bi mirinê xwe amade dike. Ji bo mirinê Ocak dibêje ku *"piştî mirinê rihê mirov derbasî qalibek din dibe"* (2005, r. 183). Bi rêya reenkarnasyonê dibe ku laş ji zayenda ku hatîye avakirin xelas bibe. Ji ber vê yekê ev mirin dikare wekî reenkarnasyonê jî bihê dîtin. Bi rêya reenkarnasyonê, rih laşekî herî bêkêmasî digere. Yanî ev mirin xwegihandina jîyana homoseksuel e, dikare bihê dîtin. Mirina xwe bi destê xwe anîn, di nav îslamê da wekî guneheka mezin dihê dîtin, wê demê xwegihandina rihê pîroz jî bêmane dimîne. Li gor Halberstamî rêyek nû dikare di vir da bihê dîtin. Ev yek jî bi rêya pasîfbûn û bi awayên mazoşîst xwe dikare di nav pergala serwer da derxe (Halberstam, hb, r. 179). Halberstam di vir da bi tercîha mirinê li ser çîroka Xuelayê disekine; Xuela bi tercîha mirinê rola xwe red dike û nasnameya ya din red dike (hb, r. 179-180). Vê nêrîna Halberstamî em daxilî nav destanê bibin, di destanê da Mem xwe di nav windabûnê da dihêle û di nav vê çîrokê (pergala heteroseksuel) da dê xwe derxe. Rê li ber mala Hesen, Çeko û Qeretacînî bi temsîla guherbarî, piralî û parçekirî vedike.

Em dikarin heman xwendina queer ji bo tunebûna malbatê jî bikin. Li gor Halberstamî; *"Heke ku arezûyên me, meylên me normatîf û heteroseksuel bûna, wê demê ji alîyê malbata me ve di beralîkirinek di warê zewac, mezinkirina zarokan û zêdebûna-hetero da îhtimal e ku em mibtela wan nedibûn"* (2013, r. 43). Dayîk û bavê Mîr Ezînî, Zîn û Sitîyê kengê mirine, nedîyar e. Halberstam li ser gotina Wollfê analîzekê dike ku ev analîz wiha ye: *"Heke em jin bin em raborîya xwe li gor dayîkên xwe difikirin"* (2013, r. 171). Di destanê da ne eşkere ye û li gor atmosfera destanê jî tu dibêjî qey dayîk û bavê xwe qet nedîtine yan jî di biçûkîyê da winda kirine. Ji ber vê yekê ev kes ji bo jîyaneka hetero-patrîarkî nehatine terbîyekirin. Belê dikare bihê gotin ku bi mirina dayîk û bav di nav çandê da ji bo zarokan alternatîfeka din bihê dîtin; lê ev yek jî di destanê da nayê dîtin. Tu kesî dayîkbûn û bavbûn hînî wan nekirîye û di queer da mane. Bi vê yekê ev kes raborîya xwe ji malbatên xwe hîn nabin û di queerbûnê da dimînin. Mijareka din jî ku heteroseksuelîyê serûbin dike xwedîbûna fallusî ye, ev jî berê me dide têgiha fallusê.

### 2. 3. 2. Fallus

Li gor Arikî; *"...bi rizaya mirovan hegemonya ava dibe. Ji ber vê yekê mêrîtîya hegemonîk, li ser jin û mêrên din, bi rizaya wan îqtidar dihê avakirin"* (2016, r. 235). Bi vê yekê hezar û pênc sed xortên kurdan, bi riza dilê xwe di bin hikimê Memê Alanî da ne. Ev hikim her tiştî bi xwe ra diîne. Çinku takekesî winda dibe û bi rizaya wan kesan, êdî Mem li ser her laşî mêrtîya xwe pêk diîne (Lescot, hb, r. 94-97). Îqtidar ji xwe ra objeyan diafirîne û ji ber vê yekê zayenda ku li gor laşî pergala heteroseksuel ava dike û pûç derdikeve; ji xwe ra objeyan çêdike û kesîtî tune dibe û kes/kom di bin îqtidara laşekî da dihên mêtin. Ev laş ji bo her pêdivîyî dihê bikaranîn; çinku bêîrade ne.

Connell vê yekê weha dinirxîne: *"Hesta hêzê ya girêdayî mêrîtîyê ku hegemonyaya xwe li ser jinan ava dike, vê arezûyê li hember mêrên din ra jî nîşandan dide, eleqedar dibe"* (2016, r. 135). Ev jî ji ceribandin yan jî pratîkên cinsî wêdetir e. Lê tiştê herî balkêş ku Connell dibêje, *'li hember mêrên din ra jî nîşandan dide, eleqedar dibe',* ev jî homoseksuelî ye, wekî ku Butler li ser ramanên Lacanî disekine û dibêje ku *"ji bo xwedîbûna fallusî, pêdivî bi yên din heye. Hem bûyîna objeya arezûyên nêrzayî, bûyîna yên din e, hem jî temsîl kirina vê arezûyê yan jî pêhisandin e"* (2014a, r. 103). Li gor vê zagonê ku jin di fallusbûnê da ne; heke ku jin xwe ji vê rewşê derxin û şûna wan mêr tijî bikin; wê demê Qeretacîn, Çeko û Hesen jî dikare di bin hegemonyaya Memî da bimînin û Memî wekî îqtidar qebûl bikin û bikevin bin hikimê Memî. Di vê risteyê bigire *"Niha her sê bira wê biqedînin mesela Padîşahê Kurdane"* (Lescot, hb, r. 82) di gelek cihan da ev hegemonya xwe nîşan dide. Yanî civak di wê demê da jîyana homoseksuelbûnê di fallusbûnê da dikare nîşan bide. Ji ber vê yekê Zîn hem objeya arezûyên nêrzayî di xwe da dihewîne hem jî bi bûyîna fallusbûne ev yek dikare bihê derxistin ku Zîn vê kêmasîyê di arezûyên ji derveyî jîyana heteroseksuel (Lescot, hb, r. 94-97) da, di fallusbûna Çekoyî da dibîne. Eger em li gor nêzîkahîyên Lacanî li van tevgeran binêrin û wê demê Çeko, Hesen û Qeretacîn bûne yên din. Yanî fallusbûna Zînê nîşan didin. Ev arezûyên nêrzayî di xwe da nîşan didin û nûnertîya arezûyên nêrzayî di bin îqtidara Memî da dihên manedarkirin.

### 2. 3. 3. Serûbinkirina heteroseksuelî

Mem carekê wekî xortên tifil yê pazdeh salî dihê nîşandan (r. 29) û zarok yek carê da mezin dibe, bi zayendekê dihê manedarkirin. Li gor nêrîna Halberstamî em nêzîkî zayenda Memî bibin, ev yek di queerbûnê da ye (2013, r. 48). Ji ber ku Mem hê zarok e û nîşan dayîna vî karekterê di bin zayenda mêrîyê da li gor pêşqebûlkirineka çandî di bin darê zorê da xwe nîşan dide. Ev rewş jî wekî ku Butler (2014a, r. 240) bêgavîya heteroseksuelîyê ve girê dide, dikare bihê dîtin. Yanî bê îradeya kesan meyleka cinsî li ser laşan dihê barkirin. Herweha li gorî Foucaultyî di Yewnana Kevnar da *"tu tişt xortên tifil ji bo mêrên gihîştî wekî hevalkarîya cinsî asteng û qedexe nake"* (2017, r. 271). Wê demê zayenda Memî guherbar e. Ev rewş jî têra erastesbûnê dike. Herçiqas bihê gotin ku di nav kurdan da li gor wan qebûlkirineka temenê mêrîtî û jinîtîyê hebe jî lê ev rewş rastîya xamabûna laşan nîşan nade. Heye di nav pergala patrîarkî da pêşqebûlkirinek ku jin wekî hestyar, pêjnker û mibtela û mêr jî wekî pêşeng û azad dihên dîtin. Ji alîyekî din ve di guhên xortên sivik da qala guharan dihê kirin (Lescot, hb, r. 40). Sembola guharî di nav her çandê da maneyek cuda dide. Li gor Erbekê; *"Sembola cinsî ye. Padîşah û Derwêş yek jî zenne*[23] *guhar xistine guhê xwe"* (Erbek, 2006). Jinan ji bo xemilandinê guhar bi kar dianîn. Di pirtûka *Şerefnameyê* da jî ev guhar di mînyaturan da bi şikileka nazenîn dihên dîtin. [24] Di vê mijarê da ji bo laş/bedenê Elçik (2016, r. 188) dibêje ku şertekî civakbûnê heye. Bi rêya têgihîştina li ser laşan zayenda laşan dihê dîyarkirin. Pergala patrîarkî bi hin polîtîkayan laşan dixe bin kontrola xwe. Li gor kodên zayenda civakî heke em li vê rewşê binêrin ev yek dikare bihê derxistin ku ev xortên sivik di rewşa homoseksuelîyê da ne. Ev sembol di nav çanda kurdan da di nav mêran da ji bo çi xwe nîşan daye, ez negihîştim tu agahîyeka zelal. Lê em dikarin bibêjin ku çandan bandorê li derûdorê xwe jî kirîye. Ji sedî sed mirov nikare vê îdîayê bike ku guhar homoseksueltîyê temsîl dike jî lê taybetîyên ku civakê li jinan bar kirine; wekî mînak ji cilan bigire heta xemilandina wan, ji tevgerên nazenîn bigire heta tevgerên hişk ku li gor zayendê hatine dîyarkirin; guherbarîyek zayendê li ser van xortên di destanê da hatîye nîşandan. Yek jî ku homoseksuelî heta demekê xwe di nav çandan da nîşan dida, wekî di dewleta Osmanî (Elçik, 2016, r. 193) da heta dema tanzîmatê

23 Ev têgih ji bo kesên ku di cimaeta mêran de reqs dikin, xwe sorav dikin û bi miran ra hevşadibin, dihê gotin.

24 *bin.* Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, Zîya Avci (wer.), Avesta (weş.), İstanbul 2007, r. 240-241.

homoseksuelî eyb nedihat dîtin û tesbîtên Foucaultyî û gelek agahîyên din, dikare bihê gotin ku di nav kurdan da jî jîyana homoseksuelî hebûye û ev yek jî jîyanek asayî hatîye dîtin û ji ber van yekan di minyatûran da nîşandana nazenînîya li ser laşên nêrza tiştekî ji rêzê bûye. Heman tişt ji bo xortên tifil[25] yên di destanê da jî tiştekî ji rêzê bûye. Dengbêj bi vî awayî hestên xwe sotandine.

Di destanê da di rista 1589an (Lescot, 2010, r. 80) heta rista 1703an (Lescot, hb, r. 111) da çanda di nav feodalîteya Ewropayê da ku li Îskoçyayê xwe nîşan dide dihê dîtin. Wekî mînak di van rêzan da *"Keç û bûkan tev li cihekî kom bikin, yê ko ne kete emrê we, guliyên wan li destên xwe bigerînin", "Li pê xwe tar kin, di erdê ra bikişînin*", "di Memî va bixewînin" (Lescot, hb, r. 82). Di dema qiral Edwardî da, rîtuela *jus primea noctis/mafê şeva yekem* hebû. Di destanê da ev yek ne heman rengî be jî lê bi awayekî cuda xwe nîşan dide. Di vê tevgerê da ne tenê teşeyeka bêçaretî û teslîmîyetê dihê dîtin. Di vir da objekirina laşê jinê xwe nîşan dide. Ji alîyekî ve jî berevajîkirina arezûyên mêran yên homocivakî ye. Rewşa li Ewropayê herçiqas li ser îstismar û îqtidarê bihê ravekirin jî lê çavkanîyên ku min ji bo xebata xwe bi kar anîn wekî nêrînên Butler, Foucault, Beauvoir, Wittig, Irigaray û Kristeva û gelekê din; li ser zayend û zayenda civakî bi rêya înşayê û telafûzên patrîarkî ku taybetîyên wekî bêçaretî û teslîmîyet li ser laşê jin û yên din çawa hatîye barkirin, nîşan dide. Vê rewşê jî li ser laşê jinê xwe nîşan daye. Pratîkên cinsî xwe di arezûyan da dihêlin û laşê jinê ji bo van arezûyên homoseksuel ji bo hezê dihê bikaranîn (Butler, 2014a, r. 99).



Li gor Butlerî divê nasnameya jinê û mêrî bihên windakirin ji ber ku ev hêmakirinan ji tekrarkirinê û bi darê zorê ava bûye; ji ber vê yekê divê derfeta nasnameyeka din bihê çêkirin (Butler, 2014a, r. 237). Arezûyên homoseksuel di tevgerên Hesen, Çeko û Qeretacîn wekî pratîkekê xwe nîşan didin lê di bin banê evîna Memî û Zînê da ku dihê avakirin; gotinên Butlerî diîne bîra mirov ku dibêje; *"Di helbestên romantîk da xweşgotinên ku ji jinan ra dihên nîşandan averêkirina hestên homocivakî ne. Jin di wir da objeya danûstendinê ye. Ev jî arezûyên yên di navbera mêran yên nayên qebûlkirin [veşartî] dide der"* (2014a, r. 237). Di tevgerên Hesen, Çeko û Qeretacînî da jî em vê nêrîna Butlerî dikarin bibînin. Ji ber vê yekê nikare bihê gotin ku Hesen, Çeko û Qeretacîn li hemberê Memê Alanî fedakarî nîşan dane; dest ji hevser, destgirtî û jinbirayê xwe berdane. Arezûyên homoseksuel

25 Ev têgih ji bo kesên di warê laşî de hê jî ku xama nebûne, dihê gotin.

di bin banê fedakarîyê da nikare bihên veşartin; dibe ku van arezûyan di Zînê da teşe girtibe. Zîn çima bi Çekoyî ra bû, deng ji Bekoyî derneket? Hestên civakê yên cinsî li hember Memî bi queerkirina Bekoyî dihên veşartin. Heke tevgerên Bekoyî li gor nirxên civakê bihên nirxandin, tenê bihesûdîyê nikare bihê bersivandin. Di derbarê mijarên wekî bedewbûn, homoseksuelî û di gelek cihan da li ser arezû, hez û hestên homoseksuel agahî hatibûn dayîn; heke ku ev sekina Bekoyî bihê nirxandin, li gor ramanên Sedgwick, Halberstam, Butler, Foucaultyî ev tişt dikare bihê gotin di hemû kesan da arezûyên homoseksuel hene lê bi ser navê Bekoyî ev hest dihê queerkirin û civak xwe bi saya Bekoyî di nav queerbûnê da xwe xelas dike. Bi vî awayî hestên homoerotîk di telafûzê da xwe winda dike. Mem ji paidikatîyê da derdikeve û di nav civakê da bi rêya erastesê nebe jî wekî li gor fikirên Sedgwickî, bi evîna Zînê xwe dide qebûlkirin û statûya xwe di nav civakê da bi dest dixe.

Evîn herçiqas li gor nirxên civakê, wekî ku her kes heteroseksuel e, li ser hestên mirovan pêkutîya çandê xwe nîşan bide jî lê *“ceribandineka subjektîf e”* (Schroedter&Vetter, hb, r. 22). Bi vê yekê dîroka evînê li gor berjewendîyên demî yan hatîye guhartin yan jî hatîye veşartin; ev yek nikare subjektîfîya evîna dengbêjan veşêre. Ji ber ku meylên cinsî li gor xwestekên serdestan teşe nagirin. Herçiqas bi rêya evînê, cinsîtî bihê meşrûkirin jî bi vê yekê kêf, arezû, hez û hestên dengbêjan yên homoseksuel nayê temirandin (Schroedter&Vetter, hb, r. 38); bi rêya masturbasyon/sotandina heteroseksuel (evîna Memî û Zînê) ev hestên homoseksuel dihên gurkirin. Yanî di destanê da arezûyên homoseksuel serî li ber arezûyên heteroseksuel natewînin.



Herçiqas li ser Mem, Qeretacîn, Hesen û Çekoyî mêrîtî bihê berzkirin jî *“Dema ku mirov [ji bandora nirxên civakî xelasbûn ku ev jî mekanterkkirin e, yanî bi azadbûnê], nasnameya wan diguhere. Ev sînor di navbera nijadan, cimaetên dînî yan jî di navbera komên zimanî da dibe”* (Vanita, 2011, r. 134). Vê nêrîna Vanitayê em daxilî nav destanê bibin ku bi rêya lêgerîna hestên homoerotîk, evîn li ser dîyalekta jin û mêrî (Zîn û Mem) dane avakirin. Derketina ji bajarê Mixribê dibe ku ji bo mehrema hestê homoerotîk be. Ev yek ji fikirên kolonyalîst û serwerîya Rojava dihê. Cervulle û Rees-Roberts ji Mercerî (1994, r. 133) radigihînin û dibêjên ku *“em wekî mêrên reş di derûdora pêdivî, hesret û arezûyên mêrên çermspî [Rojavayî] da cih digirin”* (2015, r. 133). Destan ne tenê li ser qehremanî û evînê (ya heteroseksuel) ava dibe. Têkilîya di navbera Mem û Hesen û birayên Hesenî

tenê bi hevaltî yan jî biratîyê nikare bihê ravekirin û li ber hin ramanên din rê bihê girtin. Li ser cinsî, zayend û têkilîyan Schroedter û Vetter dibêjin ku *"pirevînî tiştek wisa ye çi ye yan jî çi nîne gelek vesînorkirinên wê hene (...) di nav van da hevaltîya dilsoz jî heye"* (2014, r. 37). Têkilîya di navbera Memî û Zînê da nikare vê hebûnê veşêre. Di nav vê pirevînîyê da Mem, Zîn, Hesen, Çeko û Qeretacîn xwe dibînin. Dibe ku di nav vê pirevînî da Beko û gelek kesên din jî hebin. Gelek dijwar e ku mirov bibêje ev hest di wan da tune ye. Xwekêmdîtin kelecanek mezin e ji ber vê yekê ev kelecan di laşê Hesen, Çeko û Qeretacînî da peyda dibe. Cervulle û Rees-Roberts ji Gary Fisherî (1996) radigihînin û dibêjin ku *"biçûkxistina nijadî heta tu bibêjî heyecandar e. Zencîyê we bûn, malê we bûn, ji we û çermspîbûna we ra hurmet girtin, kêfa min jê ra dihê"* (2015, r. 135). Herçiqas bi rêya bilindkirina nijada Memî dengbêj hestên xwe yên homoerotîk veşêre jî lê ne mimkun e. Ji bo hetero-patrîarkî divê dualîzm hebe û ev yek jî dihê avakirin. Fallus ji xwe ra ya/yê din çêdike. Butler dibêje jinbûn ji mecbûrbûna çandê dihê. Ji ber vê divê nasnameya jinê ji nav dualîzma heteroseksuel bihê derxistin.

Herweha têkilîyên kurbazîyê û çanda *bacca bazi* (Schroedter&Vetter, hb, r. 84), di sedsala 18an da têkilîyên di navbera zayendan da guhartinên mezin bi xwe ra anîn wekî tovê malbata xwerû hate avêtin (Schroedter&Vetter, hb, r. 106-109) yan jî jîyana Mosoyan (Schroedter&Vetter, hb, r. 134-143) û di sedsala 19an da jî êdî evîna heteroseksuel derî li ber hestên queer dida girtin (Schroedter&Vetter, hb, r. 109-112). Bi van agahîyan dikare bihê gotin ku çanda kurdan ne dûrî çanda derûdor e. Herweha li gor van agahîyan û li gor nêrînên Elçikê (2016, r. 193), Afary û Anderson (2011, r. 254), Butler (2014a, r. 99, 237) û gelek teorîsyenên din heman tiştî di nav kurdan da jî li gor teorîya Queerê dikare bihê gotin ku rû daye û heta demekê hestên homoseksuel wekî tevgerek normal[26] hatine dîtin. Dengbêj li gor polîtîkayên demî, evînê di bin banê heteroseksuelî da dabin nîşandan jî lê bi rêya heyranîya nijada Rojavayî (Mixrib) ev polîtîka têk çûye. Geştyarên Rojavayî ji bo arezûya cinsî (homoseksuel) li bajar/welatên kolonî gerîyane. Ma vê rewşê di nav kurdan da li ser vegotinên gelêrî û dengbêjan qet bandora xwe nehiştîye? Ne mimkun e (Afary&Anderson, hb, r. 228-235, 252-261). Dengbêj ji bo bibe zencîyê Mixribê tev digere û ev rewş li gor tesbîtên Cervulle û Rees-Robertsî (2015, r. 135) dikare bihê nirxandin. Ma qira mêran li Cizîrê hatîye ji Mixribê xerîbek tijî lîbîdo dihê bajarî û her kes (xeynî Beko) fedakarîyê ji vî mirovê xerîb ra nîşan didin û dilxwaz

26 Li gor telafûza heteroseksuel

in ku jin û destgirtîyên xwe bidin wî. Herçiqas ev sekin di karekterê Hesenî da, wekî li ser soza xwe sekinandinê bihê manedarkirin jî lê dîsa jî ev rewş di queerbûnê da asê dimîne. Heke ku xela mêran li Cizîrê nehatibe; van gotinên Afaryê û Andersonî (2011, r. 254) ku dibêjin; ji bo xwesteka homoerotîk bi rêya jinê îfade dikin û di navbera salên 1200-1400î da Sadî û Hafiz li ser xortên 14 salî pesnê bedewbûna wan dane, diîne bîra mirov. Ev yek di destanê da jî xwe nîşan dide. Derî li ber hestên guherbar vedike û li ser guhdaran bandora xwe nîşan dide. Yanî bi gotina Sedgwickî û Najmabadiyê dilkêşîya homoerotîk, di navbera xwînerê mêr [guhdarê mêr] di gel navbera objeya arezû ya di tekstê [vegotinê] da dide der (Afary&Anderson, hb, r. 254). Çima Mem? Dengbêj laşê xwedî penîs di heyranîya nijadî da sanahî kirîye. Fantazma erotîzmê di nijadê da xwe dibîne û di ciwantîyê da hatîye fetîşezikirin.

**Encam**

Herçiqas nirxên civakê û bêgavîya heteroseksuelîyê hestên homoseksuel di nav edebîyata gelêrî da bifetisînin jî lê li gor teorîsyenên Queerê hest, hez û arezûyên homoseksuel dikare bihên tesbîtkirin û nirxandin. Ji ber ku meylên cinsî subjektîf in û li gor qaydeyên çandî nikare li ser laşan bihên mecbûrkirin.



Em di destanê da pey şopên queer ketin. Mirov vê evînê tenê di nav jîyaneka heteronormatîf da nikare bi nav bike. Ji ber ku hestên dengbêj û guhdaran li gor qaydeya hetero-patrîarkî nikare dirûv bigire. Bi rêya dengbêjan heta roja îro ev rastî, li gor berjewendîyên demî û li gor nirxên civakê di gelek veguhertinan ra derbas bûne û teşe girtine. Ev encam dikare bihê derxistin ku hestên homoseksuelî hatine çewisandin û berjewendîyên hetero-patrîarkî derketine pêş. Bi vê yekê destan li ser evîna heteroseksuel dane avakirin û çanda patrîarkî bi rêya ziman polîtîkayên xwe li ser laşan mecbûr kirîye. Di dengbêj/an da heyranîya nijadî/ Mixribî yanî heyranîya Rojavayî eşkere dihê dîtin.

Herweha herçiqas tevgerên homoseksuel bihên dîtin jî jin di vulvayê da mêr jî bi penîsê da hatine manedarkirin. Bi vî awayî çanda hetero-patrîarkî herçiqas lepe don serê dilê xwe bixe jî lê xwestekên cinsî di rengekî queer da xwe nîşan didin. Yanî Mem bi têra dilê xwe penîs e. Temsîla fallusê di Memî da berhev bûye. Herçiqas ji bo nirxên civakê û bêgavîya heteroseksuelîyê hestên homoseksuel fetisandibin jî li gor teorîsyenên Queerê hest, hez û arezûyên Hesen, Çeko û Qeretacînî di nav homoseksuel da dikarin bihên nirxandin. Ji ber ku meylên cinsî

subjektîf in û li gor qaydeyên çandî nikarin li ser laşan bihên mecbûrkirin.

Wekî din herçiqas mirina Memî bi polîtîkaya xwe gihandina tînî bihê nîşandan jî lê ev mirin ber bi laşê bêkêmasî yanî reenkarnebûna laşî dikare bihê dîtin. Ev jî xwegihandina tînî pûç derdixe.

Di encamê da hat dîtin ku di destanê da zêdetir nasnameya mêrî hene. Çeko ji bo hewldaneka malbatê xwînê ji xwe bernade rewşeka queer derdixe holê. Heman tişt ji bo yên din jî bi vî rengî ye. Qeretacîn ji bo evîneka heteroseksuel qet tev nagere; tenê nasnameya wî wekî mêr hatîye pêşkêşkirin; ev jî gumana queerbûnê bi xwe ra diîne. Herçiqas evîna heteroseksuel derketibe pêş jî evîn di nav pirevînîya Hesen, Çeko, Qeretacîn, Memî û Zînê da di rengekî queer da xwe nîşan dide. Di vê xebatê da îdîaya me ne ku nîşandayîna vê berhemê wekî berhemek homoseksuel bû. Lê ji xîmên pergala hetero-patrîarkî lêpirsîn, hejandin û serûbinkirina derfetek ji bo queerkirinê ye. Ev nayê vê maneyê ku di berhemê da tenê têmayên jîyana heteronormatîf hene lê restorasyona hetero-patrîarkî eşkere dihê dîtin. Ji van xalan jî dikare bihê gotin ku destan li gor bêgavîya nirxên civakî û mecbûrkirina jîyana heteroseksuelîyê teşe girtîye.

## Çavkanî

Aça, M. , Ekici, M. & Yılmaz, A. M. (2016). Anonim halk edebiyatı. M. Ö. Oğuz (ed. ). *Türk halk edebiyatı*: el kitabı (r. 133-238). (ç. 13.). Ankara: Grafiker.

Afary, J. & Anderson, K. B. (2011, Bihar). Foucault, toplumsal cinsiyet ve akdeniz ve müslüman toplumlarında erkek eşcinselliği. Ş. Öztürk (ed. ). *Cogito.* cinsel yönelimler ve queer kuram. (werg. E. Ünal). İstanbul: YKY. 65. 228 - 261.

Arık, E. (2016). Erkeklik çalışmaları. F. Saygılıgil (ed.). *Toplumsal cinsiyet tartışmaları* (r. 231-248). (ç. 1). Ankara: Dipnot.

Berktay, F. (2016). *Tek tanrılı dinler karşısında kadın:* hıristiyanlıkta ve islamiyette kadının statüsüne karşılaştırmalı bir yaklaşım. (ç. 16.). İstanbul: Metis.

Butler, J. (2008). *Cinsiyet belası:* feminizm ve kimliğin altüst edilmesi. (werg. B. Ertür). (ç. 1.). İstanbul: Metis.

Butler, J. (2014a). *Cinsiyet belası:* feminizm ve kimliğin altüst edilmesi. (werg B. Ertür). (ç. 4. ). İstanbul: Metis.

Butler, J. (2014b). *Bela bedenler.* (werg. C. Çakırlar û Z. Talay). (ç. 1.). İstanbul: Pinhan.

Cervulle, M. û Rees-Roberts, N. (2015). *Homo exoticus*: ırk, sınıf ve queer eleştiri. (werg. A. Yalın). İstanbul: Ekslibris.

Connell, R. W. (2016). *Toplumsal cinsiyet ve iktidar:* toplum, kişi ve cinsel politika. (werg. C. Soydemir). (ç. 2.). İstanbul: Ayrıntı.

Dost, J. (2012). *Mîrname*. (ç. 2.). İstanbul: Avesta.

Elçik, G. (2016). Beden, iki nokta üst üste. F. Saygılıgil (ed.). *Toplumsal cinsiyet tartışmaları* (r. 187-212). (ç. 1.). Ankara: Dipnot.

Erbek, M. (2006). *Çatalhöyük'ten bugüne anadolu motifleri*. Ankara: Dösim Yayınları. (dîroka jêgirtinê: 09. 26. 2018). jêgirtin jihttp://dipnotkitap. net/deneme/anadolu_motifleri. htm

Erdem, T. (2012). Hizadan çıkmaya, yoldan sapmaya ve çıkıntı olmaya dair: kimlik değil, cinsellik! tektip cinsellik değil, cinsel çeşitlilik!. C. Çakırlar û S. Delice (ed.). *Cinsellik muamması*: Türkiyede queer kültür ve muhalefet (r. 37-71.). (ç. 1.). İstanbul: Metis.

Erşen, U. B. (2018). Yeni bir dil yeni cinsiyet düzeni. *Sosyoloji Araştırmaları Dergisi*. 21(1). 1-41.

Ezber, G. (2015). *Gizli arzular öldürür.* (dîroka jêgirtinê: 09. 26. 2018). jêgirtin ji http://www. gokcenezber. com/2015/10/gizli-arzular-oldurur/

Foucault, M. (2017). *Cinselliğin tarihi*. (werg. H. Uğur Tanrıöver). (ç. 8.). İstanbul: Ayrıntı.

Halberstam, J. (2013). *Çuvallamanın queer sanatı*. (werg. İ. Tabur). (ç. 1.). İstanbul: Sel.

Jackson, S. û Scott, S. (2012). *Cinselliği kuramlaştırmak.* (werg. S. Serezli). (ç. 1.). Ankara: NotaBene.

Jagose, A. (2017). *Queer teori*: bir giriş. (werg. A. Toprak). (ç. 2.). İstanbul: NotaBene.

Jung, C. G. (2012). *İnsan ruhuna yöneliş*. (werg. E. Büyükinal). (ç. 8. ). İstanbul: Say.

Kaos GL. (2007). Tanımlar/kavramlar. *biliyor(mu)sun(?) her kadın heteroseksüel değildir*: Lezbiyenler ve biseksüel kadınlar. Ankara: Ayrıntı.

Kıraç, F. (2013). *Eşcinsellikle ilgili dini-psikolojik algılar ve maneviyat (erkek eşcinsel örneklem).* (Teza doktora ya neçapkirî). Ankara: Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe Ve Din Bilimleri (Din Psikolojisi) Anabilim Dalı.

Kovel, J. (1994). *Tarih ve tin*. (werg. H. Pekinel). İstanbul: Ayrıntı.

Lescot, R. (2010). *Memê Alan*. (ç. 2.). Stembol: Avesta.

Mela Mehmûdê Bayezîdî (werg. , 2012). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*. (r. 109-110). (werg. J. Dost). İstanbul: Nûbihar.

Moran, B. (2013). *Edebiyat kuramları ve eleştiri*. (ç. 24.). İstanbul: İletişim.

Ocak, A. Y. (2005). *Alevî ve bektaşî inançlarının islâm öncesi temelleri*: bektaşî menâkıbnâmelerinde islâm öncesi inanç motifleri. (ç. 5.). İstanbul: İletişim. (dîroka jêgirtinê: 08. 20. 2018). jê girtin ji https://www. academia. edu/7536418/Alevî_ve_Bektaşî_İnançlarının_İslâm_Öncesi_Temelleri-_Ahmet_Yaşar_OCAK

Özküralpli, İ. (2016). Queer teori. F. Saygılıgil (ed.). *Toplumsal cinsiyet tartışmaları* (r. 213-229). (ç. 1.). Ankara: Dipnot.

Rubin, G. S. (2014). Cinselliği düşünmek: cinsellik politikasına dair radikal bir kuram üzerine notlar. (werg. B. Ersöz). *KaosQ +Sonbahar* (1). 23-49.

Said, E. W. (2016). *Şarkiyatçılık batı'nın şark anlayışları*. (werg. B. Yıldırım). (ç. 9.). İstanbul: Metis.

Schroedter, T. û Vetter, C. (2014). *Çokaşklılık*: bir hatırlama. (werg. Ö. Karlık). (ç. 1.). İstanbul: Ayrıntı.

Sedgwick, E. K. (1990). *Epistemology of the closet.* Berkeley. Los Angeles: University of California Press.

Stevens, H. (2011). Eşcinsellik ve edebiyat: bir giriş. H. Stevens (ed.). *Gey ve lezbiyen yazını*. (r. 7-23). (werg. K. Tanrıyar). (ç. 1.). İstanbul: Sel.

Traverso, E. (2009). *Geçmişi kullanma kılavuzu*: tarih, bellek, politika. (werg. I. Ergüden). İstanbul: Versus.

Vanita, R. (2011). Seyahatin homoerotiği: insanlar, fikirler, janrlar. H. Stevens (ed.). *Gey ve lezbiyen yazını* (r. 133-155). (werg. K. Tanrıyar). (ç. 1.). İstanbul: Sel.

Winning, J. (2011). Lezbiyen modernizmi: dolabın içinde ve ötesinde yazmak. H. Stevens (ed. ). *Gey ve lezbiyen yazını* (r. 70-89). (werg. K. Tanrıyar). (ç. 1.). İstanbul: Sel.

Yardımcı, S. û Güçlü, Ö. (2013). Giriş: queer tahayyül. S. Yardımcı û Ö. Güçlü (ed. ). *Queer tahayyül* (r. 17-25). (ç. 1.). İstanbul: Sel